# Ronahî

www.ronahi.net/ku/ | Jimar : 937 | 30-Çille - 2022 | Rojnameya siyasî, civakî û çandî

Navnîşan

www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
@rojnameyaronahî
+963 052 423165
423165
+963 938541707

الوكيل الحصري للتوزيع
شركة الشمال
shrktronahi@gmail.com
0998723906
المكتب الرئيسي: قامشلو - دوار سوني


## Desteya Jîngehê: Eger Tirkiyê çekên kîmyayî bi kar anîbin divê were cezakirin




Serokê Desteya Çêkirin û Parastina Jîngeha Herêma Kurdistanê Ebdurehman Sedîq têkildarî bikaranîna çekên kîmyayî ji aliyê Tirkiyê ve li ser xaka Herêma Kurdistanê got, bi têkiliya bi Wezareta Jîngeha Iraqê re me raporek ji bo lêkolînê şandiye, em li benda encama wê ne. Eger Tirkiyê çekên kîmyayî bi kar anîbin divê were cezakirin."

Tevî ku di sala 2021'ê de PKK'ê ji bo lêkolînkirina çekên kîmyayî çend caran bang li saziyên navneteweyî kir, lê heta niha ti tîmên cîhanî û yan ji Herêma Kurdistanê û Iraqê lêkolîn nekirine.

Serokê Desteya Çêkirin û Parastina Jîngeha Herêma Kurdistanê Ebdurehman Sedîq ku peywendiya wan ji bi vê mijarê re heye ji Rojnews'ê re axivî û got: "Mijara ji aliyê Artêşa Tirkiyeyê ve bikaranîna çekên kîmyawî sala borî kete rojevê, lê ji ber aloziya şer me nekarî tîma xwe bişînin ku rastiya nûçeyê bizanîbîn. Li gorî madeya 114'an a Destûra Iraqê, me hemahengî li gel Wezareta Jîngehê ya Iraqê kiriye û wan ji bi riya Wezareta Derve di nava hewldanê de rastiya vê mijarê bizanin. Ji bo vê mebestê jî me raporek li ser mijarê daye Wezareta Derve, ji bo lêkolînê li ser bike."

Ebdurehman Sedîq diyar kir ku ji bo raporê heta niha li benda bersiva Wezareta Derve ya Iraqê ne û wiha got:"Divê li jîngehê rastgoyî li hebe. Ji ber ku bandoriyên erênî û nerênî yên jîngehê li ser me hemûyan hene. Iraq û welatên cîran endamên peymannameyên navneteweyî ne ku Neteweyên Yekbûyî (NY) pêk tîne. Eger hate îspatkirin ku Tirkiyeyê ev çek bikar anîne, divê Neteweyên Yekbûyî (NY) li gorî van peymanan Tirkiyeyê ceza bike."

Ji 23'yê Nîsana 2021'ê ve êrişên dewleta Tirk ên li ser Başûrê Kurdistanê berdewam dikin. Ji wê demê de Hêzên Parastina Gel (HPG) bi dehan caran ragihand ku dewleta Tirk çekên kîmyawî bi kar tîne û bang li rêxistinên navneteweyî û Parlamentoya Herêma Kurdistanê û Iraqê kir ku ji bo lêkolînê tîmên xwe bişînin qadê, lê heta niha ji bo lêkolînê ti tîm neçûne qadê.

***ROJNEWS***

## Li Çiyayê Heybetsultan ji bo balindeyên kûvî xwarin danîn



**Komek çalakvanên navçeya Koye, ji bo ajel û balindeyên kûvî di sermaya zivistanê de birçî nemînin, li çend cihan li çiyayê Heybetsultan xwerek û genim danîn.**





Çalakvanê bi navê Reşîd Delak da zanîn ji ber berfek zêde li Çiyayê Hebetsultan bariye, balindeyên kûvî di peydakirina xwarinê de zehmetiyan dikêşin.

Çalakvanê bi navê Hekar Ebdulqadir jî got, "Em dixwazin wek erkekî mirovî di vê demsala Zivistanê de xwarinê bigihînin balinde û ajelên kûvî."

Hêjayî gotinê ye di çend rojên borî de li gelek deverên Herêma Kurdistanê befrek zêde bariye û piraniya deverên çiyayî bi berfê spî bûne.

***ROJNEWS***


## QUNCIKA TÊGÎNAN

| | |
|---|---|
| Astronomî (Fransî) | (Zanist) Stêrnasî, zanista stêran, lêkolînên zanistî li ser stêran li asîman |
| Astronot (Fransî) | Kesê/a bi kêştiyên esmanî li valagehê digere. Kozmonot, ezmanger |
| Astronman (Fransî) | Ezmannas |
| Dîplomasî (Fransî) | 1.Peymanên têkiliyên navneteweyî saz dikin. 2.Li welatekî biyanî û di civînên navneteweyî de karê yan jî hunera nûnertiya welatê xwe. 3. Erk û pîşeyê kesê di vî karî de dixebite. 4.Şandeya ji van kesan pêk tê. |
| Dîplomat (Fransî) | 1.Kesê bi siyaseta derve re mijûl dibe û ji bo welatê xwe hatî erkdarkirin. |
| Emperyalîzm (Fransî) | Siyaseta ku bi darê zorê welatê xwe dike serdestê welatên din. Mêtinkarî |
| Emperyalîst (Fransî) | Hêza ku xwediya fikra emperyalîzmê ye |
| Misyon (Fransî) | 1.Erk. 2.Armanc. 3.Saziya erkekî dînî, zanistî yan jî dîplomatîk girtî ser milê xwe ya ji çend kesan. |
| Misyoner (Fransî) | Kesê bi belavkirina dînekî, bi taybetî Xiristiyaniyê hatî erkdarkirin |
| Propaganda (Îtalî) | Xebata ji bo danasîn, ecibandin û belavkirina fikrekê yan baweriyekê bi gotin, nivîs yan rêbazên cuda |

### Bersiva jimara borî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | T | Î | ■ | T | ■ | M | Û | ■ | H |
| 2 | E | ■ | I | R | S | Î | ■ | Z | O |
| 3 | B | E | R | ■ | A | ■ | S | Î | ■ |
| 4 | E | N | Q | E | R | E | ■ | R | ■ |
| 5 | K | A | ■ | W | ■ | B | Ê | Ç | Î |
| 6 | ■ | M | E | R | T | A | L | ■ | R |
| 7 | O | ■ | V | ■ | Î | D | ■ | L | O |
| 8 | D | Î | D | A | R | ■ | A | A | ■ |
| 9 | E | ■ | Î | Ş | ■ | Ç | E | L | P |

### Xaçepirs



**ÇEP-RAST**

1. Di şanoyê de mêrê ku di dilqê jinê de derdikeve ser dikê... Peyva neyînî
2. Bi soranî 'av'... Aletê ku demê nîşan dide
3. Kurteya ajansa fermî ya Tirkiyê... Ji bo zavê birayê bûkê
4. Kurteya elementa hesin... Notayek
5. Dengdêrên "pêça"yê... Pisîkê nêr
6. Kevok... Nexweşiyek
7. Temaşevan
8. Çong
9. Notayek... Paqijkirina çandiniyê ji giyayên bêkêr

**JOR-JÊR**

1. (Rustemê ...) Destaneke me... Kund
2. Cînava şexsê sisiyan ji bo rewşa netewandî... Meywe
3. Tîpên navî yên "saet"ê... Cephe, bere
4. Kurteya Ajansa Fezayî ya Ewropayê... Cînava vegerok
5. Tûj... Dijberê rengî spî
6. Lib... Ne kevin... Ji wî/ji wê
7. Cureyek segê nêçîrê... Kurteya ajansa nûçeyan ya Firatê
8. Yezdanekî misrî
9. Beyreq, sembola welatan... Genimê hêrayî


# Ronahî

www.ronahi.net/ku/ | Jimar : 937 | 30-Çille - 2022 | Rojnameya siyasî, civakî û çandî


## `Emê li dijî xiyanetê çalakiyên xwe bidomînin`


Yadê Sûad: Çalakiya konvedanê ya li ber deriyê Sêmalka xiyaneta PDK`ê ji tevayiya cîhanê re eşkere kir û têkoşîna gelê Kurd xurttir kir. ***R-2***



## Waliyê Rihayê di du mehan de 7 caran bi çeteyan re hevdîtin pêk anî

Waliyê dewleta tirkî yê li Rihayê Abdullah Erîn di nava 2 mehên dawî de bi hincetên cuda herî kêm 7 caran li bajarê Serê Kaniyê û Girê Spî têkilî bi çeteyan re daniye. ***R-5***

# HÊZA KU SÛRIYÊ BIPARÊZE QSD YE




**'Lehengiya li Hesekê dewama berxwedana Kobanê ye'**

-Piştî revandina çeteyên DAIŞ'ê wê statûya Kurdan û herêmê li seranserê cihanê bixistana nîqaşê. Wê bigotana QSD nikare ewleyiya herêmê biparêze û pêdivî bi hêzeke din heye.

- Wê herêm li gorî hinek lihevkirinên nepenî radestî Tirkiyê bikiran û PDK beşeke wê bûya.

- Eger îro statûya bakur û rojhilatê Sûriyê hedef be, wê sibe statûya başûrê Kurdistanê hedef be. Ji ber wê têkçûna plansaziya ser Hesekê bi qasî serkeftina Kobanê girîng e. R/4

**Mihsin Ewedelah: Hêzên QSDê di ber cîhanê tevê de şer kiriye û hê jî şer dike.R-4**



-Dewleta tirk bi DAIŞ'ê re kar dike û xwedîya heman sûcan e. Divê çeteyên DAIŞ`ê bi dewleta tirkî re werin darizandin.R/5

- Ev çete ne yên walatê me ne, hemû yên walatên derve ne. Ji ber wê divê welatên mezin erkê xwe pêk bînin. Eger ev çete neyên dedgehkirin, wê metirsî li ser cîhanê bi giştî hebe. R/5

## Têkçûna planên li ser Hesekê bi qasî Serkeftina Kobanê girîng e





Li gorî çavdêran; êrişa DAIŞ'ê ya ser girtîgeha Sînaa di encama plansaziyeke kûr û dirêj de pêk hatiye û gelek aliyên herêmî û navdewletî tê de cih girtine. Çeteyên DAIŞ'ê jî tenê amûrek pêkanîna komploya hêzên paşperdeya wê ne. ***R-4***

## Destê dagîrkeriya tirkî û rêjima Sûriyê di êrişên çeteyên DAIŞê de heye



Mihsin Ewedelah: Bi lehengiya Hêzên Sûriyaya Demokratîk û piştgiriya gelên herêmê, planên dijminên mirovayiyê têk çûn. ***R-4***

## QSD: Em pabendî peymanên têkildarî parastina mafên zarokan in




QSD`ê bersiva daxuyaniya UNICEF`ê ya têkildarî rewşa "Eşbal El-Xîlafê" da û diyar kir ku ew ji bo parastina wan zarokan û ewlehiya gel neçar man ku wan zarokan di girtîgehê de bigirin. Her wiha eşkere kir ku ew pabendî lihevkirinên taybet ên parastina zarokan e. ***R-3***

## QSD'ê nasnameyên 11 şervanên di operesyaona li dijî DAIŞ'ê de şehit bûyîn, eşkere kirin



QSD'ê nasnameyên 11 şervanên xwe yên 22'ê Çile di oprasyona li dijî çeteyên DAIŞ'ê de li girtîgeha Sînaa ya li Hesekê şehîd bûyîn, eşkere kirin. ***R-3***

## Pêşdîtinên Ocalan...

Farûk Sakik **R-4**

## Ala Rêber Apo her li jor diheje

Idrîs Henan **R-5**

## Ambargoya hikumeta Şamê û topbarana dewleta Tirkan!

Ji çend salan ve ye hikumeta Şamê li ser kantona Şehba ambargo daniye da projeya Rêveberiya Xweser tine bike û gel li dijî rêveberiyê hêrs bike. Ev jî hemwextî êrişên artêşa Tirkan yên ser herêmê pêk tê. ***R-6***

## Sala 2022'yan li herêmên hikumeta Şamê bi kuştina 7 jinan dest pê kir!

Sûcên li hemberî jinan li herêmên hikûmeta Şamê sala 2022'yan bi kuştina Ayat Refa`î dest pê kir û bi kuştina Betol Seqir jî dewam kir. Çalakvanên jin gotin, pêkneanîna qanûnê û nêzîkatiyên bi zanebûn yên saziyên têkildar, dibin destek ji sûcdar re û rê li pêşiya sûcan vedikin. ***R-2***

## Zeyneb Mûrad: Hevdemiya êrişan organîzekirî bû

Rêveberiya Kongreya Star ya Kantona Hesekê Zeyneb Mûrad got, êrişên vê mehê yên ser bakur û rojhilatê Sûriyê, plankirî bûn, ne ji nişka ve bûn. ***R-5***

## Kongra Star ya Ewropa serkeftina QSD`ê pîroz kir

Koordînasyona Kongra Star ya Ewropa serkeftina Hêzên Ewlekariya Hundir bi piştgiriya QSD`ê pîroz kir û got, divê civaka navneteweyî û hêzên navneteweyî berpirsyariyên xwe bînin cih û eniya têkoşînê li dijî dijminê mirovahiyê bikin yek. ***R-3***

# Sala 2022'yan li herêmên hikumeta Şamê bi kuştina 7 jinan dest pê kir!

**Sûcên li hemberî jinan li herêmên hikûmeta Şamê sala 2022'yan bi kuştina Ayat Refa`î dest pê kir û bi kuştina Betol Seqir jî dewam kir. Çalakvanên jin gotin, pêkneanîna qanûnê û nêzîkatiyên bizanebûn yên saziyên têkildar, dibin destek ji sûcdar re û rê li pêşiya sûcan vedikin.**

Navenda Nûçeyan/Qamişlo

### 7 jin ji destpêka salê ve hatin kuştin

Bênavber li herêmên hikûmeta Şamê sûcên li hemberî jinan dijwartir dibin. Ji destpêka salê ve heta niha li gorî hatiye zanîn 7 jin li bajarên cuda hatine kuştin. Li ser mijarê berdevka Meclisa Jinên Sûriyê ya ofîsa Helebê Heyfa Hesen û şêwirmenda qanûnî ya rêxistina Sara Neda Melkî ji me re axivîn.





### Her heft sûc:

Şeva sersalê 2022'yan jina ciwan ya bi navê Ayat Refa`î (19) ku dayîka keçeke 2 salî ye ji aliyê hevjînê xwe Xeys EL-Hemewî , xezûr û xesûya xwe ve piştî işkenceyeke bi hovitî li Şamê tê kuştin.
9ê Çileyê, Emel ya 11 salî li navçeya Xezaliyê ya derdora Şamê piştî hewldana destdirêjiyê ji aliyê birayê wê ve, serê wê ji aliyê heman birayî ve tê jêkirin û cenazeyê wê tê şewitandin.
10ê heman mehê Yamin Mesûd li gundê Sumeyd yê Siwêda du keçên xwe (Meryem (16) dayîka zarokekî û Wî`am (18) dayîka du zarokan) bi guleyan dikuje û direve.
14ê mehê Sewsen ya temenê wê 40-50 salî li mala xwe li navçeya Şêx Se`ad ya Teretosê kuştî tê dîtin. Herwisa di heman şevê de û li heman herêmê jineke ku nasnameya wê nehat naskirin, li nêzî deryayê jehrkirî mirî tê dîtin.
23yê heman Mehê, hat ragihandin ku Betol Seqir li gundê Cebîra yê girêdayî Qerdaha ya Latiqiyê ji ber serma û seqemê jiyana xwe ji dest daye. Lê TibaEdlî di 25ê mehê sedema mirinê red kir û sedemên biguman derxistin holê û hê encama dawî ne hatiye ragihandin.
Ev jimar tenê ya li ser torên civakî tên parvekirin û heqîqeta sûcan rave nake. Pir sûc tên veşartin û jimara sûcan ya rast ji vê pirtir e. Jixwe ti amarên fermî ji aliyê Hikûmeta Şamê ve nayên ragihandin.

### Li Sûriyê sedemên bingehî yên sûcan çi ne?

Berdevka Meclisa Jinên Sûriyê Heyfa Hesen li ser sedemên sûcan wiha axivî: "Li civakên Rojhilata Navî û Sûriyê jî di nav de, ji ber hişmendiya mêr ya desthilatdar jin dinale. Çimkî mêr li van civakan jinê weke malê xwe yê taybet dibîne. Ev hişmendiya bixeter di nava nifşan de bûye mirat. Sûc, kuştin û işkencekirina li hemberî jinê di vê pergala baviksalarî û mêrî de bûye qanûn û mêr ji aliyê civakê ve nayê darizandin."
Heyfa li ser sedemên bingehî yên pirbûna sûcên li herêmên rejîma Şamê hemberî jinê ev nirxandin kir: "Yek ji sedemên ew e ku qanûnên jinê biparêzin, li herêmên rejîma Şamê nîn in. Ji aliyekî din ve civak pir ji hişmendiya DAIŞ`ê bandor bûye û çek ketiye destê her kesî de. Herwiha krîza aborî û di heman demê de kêmbûna têgihiştina jinê ya parastina mafên xwe tev dibin sedemên bingehî yê pirbûna sûcên li hemberî jinê."

### `Lawir jî vê şîwazê kuştinê nakin!`

Neda Melî wiha dawamî da axaftina xwe; "Sûcên li hemberî jinê bi rengê herî qirêj û hovane tên kirin. ji ber vê hişmendî û hizrê, gelek mêr ji mirovbûna xwe der ketine û bûne dirinde; kar û hizrê dervê mirovan dikin. Hest û fikirê ku pê sûc dikin, lawir jî nake. Bi şerê taybet yê dagîrkeran civakê digihîne vê rewşê. Sîstema kapitalist bi armanca ji hevxistina civakê û jiholêrakirina civakbûyînê polîtîkayek qirêj dimejîne û civakan digihîne vê asta ketî."

### Qanûn û saziyên têkildar li kû ne, çi dikin?

Li gorî medya xwecihî kujerên Eyat Rifayî endamê artêşa Sûriyê Xeys EL-Hemewî û dêbavên wê ne. Dêbavên wê destpêkê xwestin sûc wek mirineke normal bidin xuyakirin. Lê piştî piştî ku cîran û çalakvanan li ser torên medyaya civakê sûc riswa kirin saziyên têkildar neçar man ku dest bi lêkolînan bikin. Piştî lêkolînên li ser bûyerê her tişt diyar bû û her sê kujer hatin destgîrkirin.
Neda wiha nirxandina xwe dewam kir :"Mixabin gelek sûcên li dijî jinan tên veşartin û jimara rast ya sûcan diyar nabin, jixwe zelalnekirina sûc ji aliyê desthilatê Şamê qet nîne. Eger kujer, ango sûcdar li ser sûcê xwe neyê cezakirin tê wateya ku rejîm tevlî tundiya li ser jinê, ya li ser civakê dibe."

### `Hikûmeta Şamê jin û rêxistinên wan çewisandine û ji holê rakirine`

Şêwermenda qanûnî ya Rêxistina Sara herwiha diyar kir ku li herêma di bin serweriya Şamê de têkoşîna jinê û rêxistinên wan berhevkirin bi herêmên Rêveberiya Xweser re, pir kêm e û ev agahê da: "Berî niha Yakitiya Jinan mijarên girêdayî jinan li herêmên destnîşankirî dişopandin. Lê niha ev yekîtî çi dike û li kû derê ye? li ser Evqas sûcên tên kirin daxuyaniyek jî ji aliyê wê nehatiye dayîn. Lewra hikumeta Şamê kar û çalakiyên rêxistinên jinan asteng dike û diçewisîne. Ev rewş tê spandin û ev tundiyeke qanûnî ye. Jixwe sûcên tên naskirin tev li ser medyaya civakî tên belavkirin û ti saziyê û rêxistinê jinê ku bibandor bin nînin."

### Saleke herî bixeter (2021) ji bo jinê derbas bû!

Hêjayî gotinê ye ku sala 2021ê saleke herî xerab û bixeter ji bo jinên Sûriyê -ji aliyê Peymangeha Cortawn ya ji bo aştî û parastina jinan û navenda Bro li Neteweyên yekbûyî 19ê mijadarê raporeke berfireh, hat niraxandin. Herwisa raporê teqez kir ku Sûriyê welatê herî bixeter e li ser asta cîhanê ku sûcên rêxistinkirî tên kirin.

# `Emê li dijî xiyanetê çalakiyên xwe bidomînin`

Darîn Silê/Qamişlo

**Yadê Sûad: Çalakiya konvedanê ya li ber deriyê Sêmalka xiyaneta PDK`ê ji tevayiya cîhanê re eşkere kir û têkoşîna gelê Kurd xurtrir kir.**

Çalakiya Konvedanê ya ji aliyê Malbatên şehîdan ve ya li ber deriyê Sêmalka hatî lidarxistin, piştî 111 rojan 23`ê Çile hat qedandin. Lê malbatên şehîdan dan zanîn ku, ji bo giritina cenazeyên şehîdan û piştgiriya berxwedana gerîla, herwiha şermezarkirina xiyaneta PDK`ê wê li her deverê bi şêwazên cuda çalakî bên lidarxistin.
Çalakiyê nêzî 4 mehan domand, lê PDKê cenaze teslîmî malbatan nekirin. Vê dawiyê jî bi behaneya vê çalekiyê deriyê Sêmalka li ser gelê bakur û rojhilatê Sûriyê girt û ambargo li ser gelê herêmê giran kir.

### 'Tişta herî biêş zarokên me bi destê xiyanetê şehîd dikevin'

Derbarê mijarê de dayîka Hefrîn Xelef Yadê Sûad da zanîn ku rojane çalakî dişopand, lê ti bersiv negirtin û wiha axivî: "Ji bo ku em cenazeyên zarokên xwe Tolhildan Raman û Serdem ku li gundê Bêxmê yê girêdayî Xelîfanê li başûrê Kurdistanê bi destê çekdarên PDKê şehîd bûne bigirin, me li Sêmalka çalakî li dar xistibû. Çalakiyê 111 rojan dewam kir. Wek Dayîkên Aştiyê û dayîkên şehîdan me rojane çalakiya kon dişopand û ji PDKê xwest ku cenazeyên zarokên me yên şehîd radestî me bikin. Herwiha me bang lê dikir ku ji xeta dijminayiya Kurdan vegere û dev ji hevkariya dewleta tirkî berde. Lewra gerîla ji bo azadiya Kurdistanê li hemberî dijminên Kurdan şer dikin. Tişta herî biêş ew e ku dema em dibînin zarokên me bi destê Kurdên xayîn tên şehîtxistin û cenaze nayên dayîn. Ev ji êşa şehadetê zehmettir e."

### `Di ancama çalakiyê de xiyaneta PDK`ê pirtir eşkere bû`

Yadê Sûad teqez kir ku, çalakiyê xiyaneta PDK`ê pirtir eşkere kir û wiha dirêjî da axaftina xwe: "PDK dixwaze Tevgera Azadiya Kurdan lewaz bike. Em jî dibêjin, ev xiyanet e, rûreşî ye. Ne şêhîdên me yên niha tenê, gelek şehîdên din bi destê PDK`ê hatine kuştin. Lê em soz didin heta dawî li hemberî vê xiyanetê bisekinin. Wek Dayîkên Aştiyê emê her tim doza mafê xwe bikin û destekê bidin şervanên azadiyê. Çimkî me soz daye rêber Abdullah Ocalan û şehîdan xwe."

### 'Êdî bes e ji xiyanetê vegerin'

Yadê Sûad bal kişand ser hevkariya PDK`ê ya bi dewleta tirkî re û ev xal li axaftina xwe zêde kir: "Her kes dibîne ka li rojavayê Kurdistanê çi dibe. Rojane êriş li ser gelê me tên kirin. Herwiha zarokên çar salî li ber çavê wan canê wa parçe parçe dibin. Li şûna ku PDK xiyanetê bike û zarokên Kurdan şehîd bixe, bila were li kêleka hêzên berxwedêr û lehengên azadiyê şer bike."



Yadê Sûad da xuyakirin ku çalakiyên wan yên ji bo radestkirina şehîdan û şermezarkirina xiyaneta PDK`ê nayên sekinandin û wiha got: "Rast e çalakiya me ya li Sêmalka hat bidawîkirin, lê em ranawestin emê ji Dêrikê heta Girê Spî çalakiyan li dar bixin."
Dayîka Hefrîn Xelef Yadê Sûad di dawiya axaftina xwe de got, em wek jin û Dayîkên Aştiyê yên bakur û rojhilatê Sûriyê, PDK`ê şermezar dikin û ji wan re dibêjin, êdî bes e ji xiyanetê vegerin, nirxê xwe û yê kurdayetiyê bizanin.



# Azadiya raman heye lê ne ji bo Kurdan!

**Li Almanyayê Dadgeha Îdarî ya Federal di sala 2019'an de biryara qedexekirina Weşanxaneya Mezopotamya û Mîr Mûzîkê da. Têkoşîna hiqûqî ya saziyên Kurdan wê bi dadgeheke bilind bidome.**

Weşanxaneya Mezopotamya û Mîr Muzîk ku du saziyên girîng ên çand û hunerê yên Kurdên li Almanyayê ne, bi biryara Wezareta Karên Hundir di 1'ê Sibata 2019'an de hatin qedexekirin. Piştî biryarê polîsên Elman dest danîn ser pirtûk, CD û arşîvên muzîkê yên li her du saziyan. Weşanxaneya Mezopotamya û Mîr Muzîk, li dijî biryara wezaretê ya bi hinceta qedexeya PKK'ê ya ji sala 1993'an ve didome, têkoşînek hiqûqî dan destpêkirin.

### Bi devkî bi şev ji parêzeran re ragihandin

Doza ku ji bo betalkirina biryara qedexeyê ya ku wezaretê li hember her du saziyan dabû û ji bo kelûpelên hatine desteserkirin werin dayîn, li Dadgeha Îdarî ya Federal ku saziya hiqûqa îdarî ya herî payebilind a welêt e li bajarê Leipzigê hat dîtin.
Di rûniştina dozê de ku pêr danê sibehê dest pê kir û tevahiya rojê dom kir, heyeta dadgehê biryara ku diviyabû saet di 17.00'an şûnde bê aşkerekirin, bi devkî bi şev ji parêzeran re ragihand.
Heyeta dadgehê biryara qedexeyê ya ku di sala 2019'an de ji aliyê Wezareta Karên Hundir ve hatiye dayîn "li gorî qanûnê" hatiye dîtin. Lê belê di danişîna ku bi saetan nîqaş di navbera parêzerên Weşanxaneya Mezopotamyayê û Mîr Mızîk û parêzerên Wezareta Karên Hundir de hatin kirin de, argûmanên ji bo qedexeyê hatin kirin yek bi yek ji aliyê parêzerên her du saziyan ve hatin redkirin.
Li gorî agahiyên parêzeran, qedeye bi vî rengî hatiye parastin: "Helbet xebatên çandî û muzîkî yên Kurdî di çarçoveya azadiya ramanê de ne, qanûnên li Elmanyayê ev pesend kiriye. Lê xebatên Weşanxaneya Mezopotamya û Mîr Muzîk nêzî rêxistineke qedexekirî tê rêvebirin û ji aliyê rêxistinê ve tê fînansekirin."
Tê payîn ku Dadgeha Îdarî ya Federal di rojên pêş de biryara xwe bi nivîskî aşkera bike, yanî biryara qedexekirinê ya ku di sala 2019'an de ji aliyê Wezareta Karên Hundir ve di encama peywendiyên qirêj ên di navbera hikûmeta wê demê Merkel û AKP-MHP'ê ve hatibû girtin."

### Dev jê bernadin

Parêzerên Weşanxaneya Mezopotamyayê û Mîr Muzik Lucas Theune ji ANF'ê re axivî û got: " Dadger di dîtina çarçoveyek qanûnî ya qedexeyê de zehmetiyan dikêşine. Piştî ku biryara Dadgeha Îdarî ya Federal gihîşte destê me em ê biryarê îtiraz bikin û ew ê pêvajoyê bibin Dadgeha Destûra Bingehîn a Federal ku saziya daraze ya bilind e."




### Arşîva Hozan Şemdîn

Herwiha Hozan Şemdîn ku yek ji mexdûrên vê dozê ye, ji rojnameya me re peyivî û got dest danîne ser arşîva wî jî. Wiha behsa arşîva xwe kir: "Arşîva min a ferdi tê de hebûn. Xebatê min yê ji bo repertuarê, stranên nû min qeydî teybê piçûk kiribû. Dema ez çûme nav gel min dengê kesên stranbêj ku min bi teybê tomar kiribu ji sala 1988 vir ve. Roportajên min ên aliyê Qafkasya, Asya Navîn, Rûsya û ciyên din. Fotrafên min, sêlikên min. Tekstên min min ên wek bîranîn ji bo xwe nivîsîbûn. Kincên min û gelek alavên muzîkê. Dest danîn ser gişan û nedan."
*Ozgûr Polîtîka*

# 'Şagirt hebin jî mamoste nînin'

**Yek ji bajarên ku herî zêde Kurdî lê tê axaftin Şirnex e. Tevî ku li Şirnexê û navçeyên wê xwendekar dersa hilbijartî ya zimanê Kurdî hildibijêrin jî, perverdeya zimanê kurdî nayê dayîn.**

Yek ji bajarên ku herî zêde Kurdî lê tê axaftin jî Şirnex e. Tevî ku li Şirnexê û navçeyên wê xwendekar dersa hilbijartî ya zimanê Kurdî hildibijêrin jî, ji ber ku li dibistanan mamoste tune ne, ev daxwaza wan tê betalkirin. Li aliyê din li gorî daneyên di sala 2013-2014'an de 53 hezar xwendekaran Kurdî hilbijartî ye. Di salên 2014-2015'an de ev rêje ji sedî 45 zêde bûye û bûye 85 hezar. Lê belê di van salên dawî de ji ber pergala perwerdehiyê ya xerab daxwaz kêm bûye.
Li hin deveran tê gotin ku li bajarên Bakurê Kurdistanê astengî ji xwendekaran re tê derxistin ku Kurdî nehilbijêrin. Malbatên xwendekaran têkildarî mijarê de serî li Baroya Şirnexê dan. Baroya Şirnexê jî bi daxwaza ku derheqê mijarê de bên agahdarkirin ji
Midûriyeta Perwerdeyê ya Şirnexê û midûriyetên navçeyan agahî xwest û vê rewşê giliyê dozger kir.
Sekretera Jinan a Sendîkaya Kedkarên Pewerdehiyê û Zanistê (Egîtîm Sen) a Şaxa Şirnexê Serap Ok derbarê mijarê axivî.

### 'Divê mamoste hebin'

Ok, diyar kir ku her çend di mufredata MEB'ê de dersa hilbijartî hebe jî mamoste tune ne û her çend li bajêr daxwazên Kurdî hebin jî di dibistanan de pêşî li vê yekê tê girtin û wiha axivî: "Tiştên ku em jê re dibêjin perwerde û hîndekarî tiştekî domdar e. Heger hûn dixwazin zarokan li ser qadekê perwerde bikin, berî her tiştî divê kesên ku di wê qadê de cih digirin û di wî warî de hatine perwerdekirin bên peyvirdarkirin. Divê perwerdekar hebin û ev perwerdekar derkevin qadan. Lê dema em niha dinêrin, tenê zanîngehek di vî warî de perwerdehiyê dide. Ji xeynî vê mamostayên me yên ku bikarin di vê qadê de perwerdê bidin û zanîngehan de bên perwedekirin tune ne."
Ok, da zanîn ku di salên borî de daxwaza ji bo perwerdehiya zimanê Kurdî zêdetir bûye û wiha got: "Li gorî daneyên di sala 2013-2014'an 53 hezar xwendekaran Kurdî hilbijartin e. Dema em li salên 2014 û 2015'an dinêrin ev rêje ji sedî 45 zêde dibe û ev hejmare dibe 85 hezar xwendekar. Xwestin pêşiya vê bigirin.



Ji ber vê yekê wan ji mufredatê ev beş derxistin. Atmosfereke ku 'Kesek vê beşê nahilbijêre' çêkirin. Bi dîtina min ev kampanya bijartina dersa Kurdî xebateke hilbijartinê ya desthilatiyê ye."
*MA*

# Hunermendê nemir Mîrê bilûrê Egîdê Cimo

**Egîdê Cimo ku bi navê Mîrê Bilûrê tê naskirin piştî koça dawî jî ji xwe dide behskirin û di çanda kurdî de ciyê xwe yê dîrokî girt.**

Egîdê Cimo sala 1932yan li gundê bi navê Erdeşer yê Ermenistanê tê dinyayê. Hunermendê Kurd Mîrê Bilûrê Egîdê Cimo, malbata wî sala 1918an di dema Şerê Cîhanê yê Yekê de ji bajarê Wanê yê bakurê Kurdistanê koçî Ermenistanê dike. Hunermend Egîdê Cimo di heştsaliya xwe de dest bi lêxistina bilûrê dike. Pişt re xwe fêrî lêxistina mey, zirne û amûrên din yên mûzîkê dike. Di sala 1955'an de di radyo Êrîvanê di beşa kurdî de bi mûzîkjenî dest bi xebatê dike. Heta salên 1990î bi hunermendên û dengbêjên weke Şêroyê Biro, Karapêtê Xaço,



Efroyê Esed, Aslîka Qadır, Aram Tigran û gelek mûzîkjenên din re dixebite.
Di gel xebata radyoyê di Enstîtûya Mûzîkê ya Romanos Melikyan (Kulize) de -ku dibistana şevê ye- dixwîne. Sala 1967'an dîplomaya dibistana bilind distîne.
Mîrê Bilûrê Egîdê Cimo, piştî salên dijêr û kedeke mezin 31ê Çileya sala 1919an li Êrîvanê koça dawî dike.

# Li fezayê stûdyoya filman tê çêkirin

Şirketa bi navê 'Space Entertainment Enterprise' (SEE) ya Ingilîzî diyar kir ku ew ê di meha qanûn de 2024'an de li fezayê stûdyoyeke filman ava bikin. Her wiha difikirin ku di warê çalakiyên werzîş û turîzma fezayê de jî plato û mekanên nû ava bikin.
Şirketa SEE di nav şert û mercên ku ewê erdkêşî qet tine be de stûdyoya filman li fezayê ava dike û dê ev stûdoyo li Axiom Station were ava kirin. Axiom Station milekî tîcarî yê 'Îstasyona Navneteweyî ya Fezayê' (ISS) ye. Dê li gel stûdyoya filman mekanekî jî bo werzîşê jî were ava kirin ku ev mekan 400 kîlometre dûrî dinyayê ye.
Space Entertainment Enterprise, çêkeriya filmê Tom Cruise yê ku ew ê îsal li fezayê bikêşe jî girtiye ser milê xwe û li gor texmînan dê di sala 2024'an de platoya film ya li fezayê jî bi dawî bikin. Dê li vê platoyê çalakiyên sînema, televizyon, muzîk û werzîşê pêk werin. Kesên bixwazin li fezayê projeyan



pêş bixin û hilberînin bi riya vê platoyê dê karibin projeyên xwe bibin serî.
*Xwebûn*

# Talana dagîrkeran dewam dike

**Li gorî Çavdêriya Mafê Mirovan ya Sûrî (SOHR) dagîrkeriya dewleta Tirkan li Efrînê bi makîneyên giran û dozeran Girê Furaq dikolin.**

Li gorî Çavdêriya Mafê Mirovan a Sûrî (SOHR) dagirkeriya dewleta Tirkan li Efrînê bi makîneyên giran û dozeran Girê Furaq dikolin. Ev gir nêzî Cindirêsê li kêleka çemê Efrînê ye. Ev girê ku wekî sîteke arkeolojîk hatiye qeydkirin, li gor SOHR´ê niha bêserûber tê talankirin.
Armanca çeteyên dagirker hem tinekirina dîroka Efrînê û hem jî firotina van berheman e.
Li gorî SOHR´ê gir bi temamî bi dozeran hatiye kolan. Erda hatiye kolan, 2 hezar û 500 metreyên bi çarçik e.
23´ê Çile jî çavkaniyên SOHR´ê dane zanîn ku çeteyên dagirker "kolana li Girê Qurtubayê yê li bakurê Efrînê bi mekîneyên giran û ên kolanê, ji nû ve dane destpêkirin."



SOHR´ê wekî din da zanîn ku li van giran û li girên beriya niha yên texrîbkirî, hem gir hatine tinekirin û hem jî ziyaneke mezin li zeviyên li dora van giran hatiye kirin.
*Ozgûr Polîtîka*

# Ambargoya hikumeta Şamê û topbarana dewleta Tirkan!

**Ji çend salan ve ye hikumeta Şamê li ser kantona Şehba ambargo daniye da projeya Rêveberiya Xweser tine bike û gel li dijî rêveberiyê hêrs bike. Ev jî hemwextî êrişên artêşa Tirkan yên ser herêmê pêk tê.**

4 sal di ser dagirkirina kantona Efrînê re derbas bû û hê jî ambargoya ku hikumeta Şamê li ser koçberên Efrînê û şêniyên herêmê yên li kantona Şehbayê didomîne.

Zextên hikumeta Şamê li ser herêmê bi êrişên şaneyên DAIŞ`ê li Hesekê û êrişên dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê li herêmê re, zêde bûn. Rêveber û şêniyên kantona Şehbayê destnîşan kir ku ambargoya hikumeta Şamê ferz dike ku bi êrişên dewleta Tirk re têne kirin, ne ji xwe ve ne, her wiha diyar kir ku ew di xaleke hevbeş de kom dibin û ew jî tunekirina Rêveberiya Xweser û şikandina îrade û berxwedana şêniyane.

Bi hatina demsala Zivistanê re, rêveberiya kantona Şehbayê biryar da ku 400 lîte ji madeya mazotê li şêniyan li ser du beşan û bi awayekî bê pere, belav bike. Komîteya sotemeniyê di beşa yekemîn de 200 lître li her malbatekê belav kir. Diviyabû ku beşa duyemîn ji madeya mazotê were belavkirin lê ji ber ambargoya hikumeta Şamê tenê 50 lîte li her malbatekê hate belavkirin.

### 'HIKUMETA ŞAMÊ BACÊN GIRAN BI SER WELATIYAN DE DISEPÎNE'

Di vê derbarê de hevserö-



ka Meclisa Kantona Efrînê Zelûx Bekir wiha axivî: "Hikumeta Şamê bacan li miqdarê sotemeniyên ku derbasî kantona Şehbayê dibin da ku bê pere li şêniyan were belavkirin, ferz dike. Di vê rewşê de sarîcek derbasî Şehbayê dibe û yek diçe ji hikumeta Şamê re. Ev ji bilî pereyên ku bendên ewlehiyê li sarîcan ferz dike, dema ku derbasî kantonê dibin."

Welatiyê bi navê Hemîd Ebdo ku di kampa Serdemê de ye wiha got: "Ji beriya 4 salan ve ew rewş dewam dike. Ambargoya hikumetê li ser me didome. Ev yek jî bandoreke neynî li jiyana me di kampê de dike nexasim demsala Zivistanê û dema ku pêlên sermahiyê bi ser herêmê de tên."

Ebdo wiha domand: "Rêveberiya kantona Şehbayê hemû derfetên xwe xistine xizmeta şêniyan de. Di beşa yekemîn de 200 lîte li şêniyan belav kir. Diviyabû ku beşa duyemîn jî were belavkirin lê ji ber ambargoya hikumetê tenê 50 lîte belav kir."

### 'TIRKIYE, RÛSYA Û HIKUMETA ŞAMÊ HEWL DIDIN WELATIYAN LI DIJÎ RÊVEBERIYÊ RAKIN'

Welatiya bi navê Henîfe Quço ji pêşiya stasyona sotemeniyê ya li navçeya Fafînê wiha got: "Siyaseteke hevbeş di navbera hikumeta Şamê û Rûsyayê de her wiha di navbera dewleta Tirk û çeteyên wê li dijî şêniyên herêmê heye."

Henîfe di axaftina xwe de behsa sedemên wan siyasetan kir û ev tişt got: "Armanc jê ewe ku şêniyan li dijî rêveberiyê derxîne û banga sotemeniyan bike nexasim madeya mazotê."

Li kêleka vê yekê hikumeta Şamê derfetê nade ku derman



û pêwîstiyên tenduristî derbasî herêmê bibe. Heger derbas bibe jî baceyên mezin li ser wan ferz dike. Derfetê nade alavên tenduristî, hin cûreyên dermanan nexasim dermanê ji bo nexweşiyên neurolojîk.

Têkildarî welatiyê bi navê



Ebdo Hemîd destnîşan kir ku tunebûna derman û pêdiviyên tenduristiyê li herêmê zehemtiyan zêdetir dike û wiha domand: "Em di kampên ku me ji sermahiya Zivistanê û bi kêmbûna rêjeyên germahiyê re, em zehemtiyan dibînin."

Hemîd diyar kir ku praniya zarokan di van deman de ji ber sermeya zêde û ku hikumeta Şamê derfetê nade ku derman derbasî Şehbayê bibe nexweş dikevin û ev yek rewşê zehmetir dike.

Ji ber ambargoya ku li ser kantona Şehbayê tê ferzkirin û derfetê nadin ku nexweş biçin nexweşxaneyên Helebê par, 4 zarokan, welatiyek (35) jiyana xwe ji dest dan.

### PILANÊN HEVBEŞ LI DIJÎ BERXWEDANA KOÇBERAN

Hevseroka meclisa kantona Efrînê Zelûx Bekir di axaftina xwe de behsa siyasetên hevbeş ku hikumeta Şamê û dewleta Tirk a dagirker li ser herêmê pêk tîne ji ferzkirina ambargoyê, girtina deriyan û hedefgirtina sivîlan, kir.

Zelûx diyar kir ku dema dewleta Tirk xwepêşandêr di salvegera êrişên li ser Efrînê di sala 2018`an de topbaran kir peyamek hewldana tunekirina şêniyên Efrînê berdewam e û piştrast kir ku dewletên destekê didin û hevkariyê dikin ku qada hewayî ji balafirên dewleta Tirk re veke ku Efrînê topbaran û dagir kir, careke din hevkariyê dike, tevliheviyê li herêman belav dike.

Zelûx got hêzên navneteweyî hemû deriyên bi Bakur û Rojhilatê Sûriyê re girt, her wiha hikumeta ŞamÊ deriyên bi kantona Şehbayê re girt û derfetê nade derman, sotemenî û pêwîstiyên rojane yên şêniyan ku derbas bibe.

Zelûx diyar kir ku pilanek hevbeş heye û kesên ku di asta yekemîn de sûdê jê digrin hevalbendên dewleta Tirk ji komên çete yên DAIŞ`ê û komên din in û ev jî ji bo projeya Rêveberiya Xweser û destkeftiyên ku bi saya hezeran pêkhateyên herêmê hatine bidestxistin, têk bibe.

Zelûx Bekir di dawiya axaftina xwe de bang li civaka navneteweyî kir ku erka xwe li hember koçberên Efrînê û tevahî herêmê bi cih bîne, zextê li hêzên garantor bike da ku hemû deriyan veke û madeyên sereke derbasî herêmê bike.

***ANHA***

# Li Qamişlo pirsgirêka mazotê tê çareserkirin

**Li Qamişlo di belavkirina mazotê de ji ber daxwaziya zêde û rewşa hewayê, derengî çêdibe. Rayedar diyar dikin ku ji bo pêkanîna pêdiviyên gel bênavber dixebitin.**

Di 19'ê Çileyê de barîna berfê li seranserê Bakur û Rojhilatê Sûriyê, li hin kolanên Qamişloyê bû sedema pirsgirêkên veguhastinê. Vê rewşê bi sarbûna hewa re, daxwazeke zêde ya sotemeniyê bi xwe re anî û di encamê de pirsgirêk çêbûn.

Berpirsên Gerînendetiya Sotemeniyê ya Qamişloyê ji ajansa me re diyar kir ku ew ji bo çareserkirina pirsgirêkan û ji bo ku gel mexdûr nebe, bi hemû hêza xwe dixebitin.

Endamê Gerînendetiya Sotemeniyê Qasim Xelef der barê zehmetiyên peydakirina mazot û gazê li bajêr de axivî û diyar kir ku ew ji roja sersalê ve qonaxa nû ya belavkirinê li tevahî bajêr didomînin û got: "Em her roja înê 11 hezar tupan (depo) ji bo tijîkirinê dişînin stasyonan. Ji ber barîna berfê û girtina rêyan a vê dawiyê, me nekarî tupan teslîmî stasyonên tijîkirinê bikin. Di rojên pêş de dê kêmasiyên di xebatên



me de çêdibin, bên derbaskirin."

### 'JI BER HEWAYA SAR TIJÎKIRINA DEPOYAN DERENG DIMÎNE'

Qasim Xelef diyar kir ku welatî bi kartên ku ji komunên taxan digirin bi buhayekî erzan ji komunûn û benzînxaneyan dikarin mazotê bistînin û ev agahî parve kir: "Her meh ji bo belavkirinê nêzî 44 hezar tup (depo) radestî Gerînendetiya Sotemeniyê tên kirin. Stasyon rojane 13 hezar tupan ji bo tevahiya Bakur û Rojhilatê Sûriyê tijî dikirin. Ji ber sermayê gaz jî tîr bûye û ev hejmar daketiye 9 hezarî."

Xelef got ji ber sermayê demên dawîn gelek zehmetî kişandine û anî ziman ku ji ber kêmbûna hilberîna li stasyona navendî hejmara tupên ji wan re tên, kêm e. Qasim Xelef destnîşan kir ku ew zêde kar dikin da ku welatî mexdûr nebin.

### ROJANE MAZOT DIGIHÎJE HEZAR Û 500 MALBATAN

Li ser belavkirina mazotê li bajêr, berpirsê Daîreya Mazotê ya Gerînendetiya Sotemeniyê ya Qamişlo Mehmûd Ehmed jî



ev agahî da: "Rojane 350 hezar lître mazot li bajêr tê belavkirin. Her kesê karta xwe bistîne, dikare mazota xwe ji 13 benzînxaneyên li bajêr hilde. Her wiha mazot bi sahrîcan radestî komunên li taxên Hilîliyê, Kornîş, Xerbî, Enteriyê, Aşûriyê, Şerîye, Erbawî, Qudûrbeg û Cûdî tê kirin. Rojane ji hezar û 500 malbatî re 220 lître mazot tê dayîn. Di qonaxa duyemîn a belavkirinê de jî 220 lître mazot tê dayîn. Me qonaxa yekemîn a belavkirinê di şeva sersalê de bi dawî kir, em di qonaxa duyemîn de ne."

Mehmûd Ehmed destnîşan kir ku sedema sereke ya pirsgirêkên belavkirina mazotê zêdebûna daxwaza ji ber sermayê ye û got: "Me di wextê xwe de dest bi belavkirina mazotê kir, lê hin malbatan dema germ bû nexwestin mazotê depo bikin. Bi sarbûna hewayê û barîna berfê re, dema ku her kesî mazotê



xwest, karê me zêde bû. Em hewl didin mazotê bidini gelê xwe."

### 'EM ZÊDE DIXEBITIN Û HEWL DIDIN DAXWAZIYAN BI CIH BÎNIN'

Mehmûd Ehmed da xuyakirin ku qonaxa duyemîn a belavkirina mazotê li ber qedandinê ye û diyar kir ku ji berpirsgirêka sahrîcan bi derengî mazotê didin komunan bikin û ev bang kir: "Kesên ku dixwazin zû xwe bigihînin mazotayê û hinekî alîkariya me bikin, dikarin mazotê ji stasyonan hildin. Stasyon ji bo xizmeta gel hatine wezîfedarkirin. Ji ber şer û ambargoyan rewşa herêma me diyar e, derfetên me kêm in. Em zêde dixebitin û hewl didin bersivê bidin daxwazan. Em ji gelê xwe dixwazin ku sebir bikin."

***ANHA***



# QSD'ê nasnameyên 11 şervanên di operesyaona li dijî DAIŞ'ê de şehîd bûyîn, eşkere kirin

**QSD'ê nasnameyên 11 şervanên xwe yên 22'ê Çileyê di oprasyona dijî çeteyên DAIŞ'ê de li girtîgeha Sînaa ya li Hesekê şehîd bûyîn, eşkere kirin.**

**Navenda Nûçeyan-Qamişlo**

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya Hêzên Sûriyeya Demokratîk (QSD) li ser malpera xwe ya fermî navên 11 şehîdan ragihandin. Herwiha di daxuyaniyê de hat teqez kirin ku .eteyên erişî gîrtîgeha Sinaa kirin piraniya wan çeteyên di herêmên di bin dagirkeriya dewleta Tirk de ne.

Daxuyaniya QSD'ê ya li ser ragihandina şehidan wiha ye:

"Ji destpêka şoreşa me ve êriş û gefên dewleta Tirk a dagirker li ser herêmên me dewam kirin û bi hevkariya hêzên navdewletî bajarên me Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî hatin dagîrkirin.

Dewleta Tirk a dagirker her tim li pêşiya têkoşîna me ya li dijî terorê bû asteng û her tim piştgiriya terorê kir. Bi taybetî têkiliya dewleta Tirk a bi DAÎŞ'ê re qet qut nebû û her tim hewl da bi rêya DAÎŞ'ê aramiya herêmê têk bibe, tevliheviyê derxe û bixe bin serweriya xwe.

Têkilîya rasterast a dewleta Tirk bi DAÎŞ'ê re careke din derket holê. Nêzî 200 çeteyên DAÎŞ'ê yên piraniya wan ji herêmên dagirkirî, Serêkanîyê û Girê Spî, bi plansaziyeke berfireh êrişî Girtîgeha Sinaa ya Hesekê kir ku 5 hezar çeteyên DAIŞ'î lê girtî ne. Bi revandina çeteyên girtî, di serî de li Hesekê, xwestin li tevahî herêmê rê li ber qirkirin û dagirkeriyê vekin.

Çeteyên DAÎŞ'ê êvara 20'ê Çileyê saet derdora 19:30'an, bi seyareyên bombebarkirî êrişa ser girtîgehê pêk anîn. Bi êrişan re çeteyên di girtîgehê de jî xwest xwe xilas bikin û birevin. Bi destwerdana lez a hêzên me ev plana wan ji destpêkê ve pêk nehat û têk çû. Di têkçûna vê êrişê de baldariya şervanên me û berxwedana wan a li dijî çeteyên DAÎŞ'ê, hem pêşî li dagirkirina herêmê girt û hem jî rê neda ku careke din xîlafeta sexte li herêmê serwer bibe. Bi vê êrişê re di serî de dewleta Tirk a dagirker, li bendê bûn ku tiştê xeyal dikirin pêk were. Lê şervanên me ew bendewariya wan di qirika wan de hişt.

Di vê berxwedanê de keç û xortên qehreman ên gelên me zîrekbûn û wêrekiyeke mezin nîşan da. Di 2 rojên destpêkê da 11 qehremanên me bi fedakarî û bi ruhê fedayî şer kir û gihîştin şehadetê. Têkoşîna wan a di vê berxwedanê de, parastina destkeftîyên şoreşê ye ku bi hezaran şehîdan hatiye bidestxistin. Em jî soza xwe careke din nû dikin ku em ê bi israr gelê xwe biparêzin û li ser şopa şehîdên xwe bimeşin.



# QSD: Em girêdayî peymanên têkildarî parastina mafên zarokan in

**Navenda Nûçeyan-Qamişlo**

**QSD`ê bersiva daxuyaniya UNICEF`ê ya têkildarî rewşa "Eşbal El-Xîlafê" da û diyar kir ku ew ji bo parastina wan zarokan û ewlehiya gel neçar man ku wan zarokan di girtîgehê de bigirin. Her wiha eşkere kir ku ew pabendî lihevkirinên taybet ên parastina zarokan e.**

DAIŞ'ê di êrişê zîndana Sînaa de xwastin zarokên 'Eşbal El-Xîlafê' yên girtî jî li hember gel bi kar bînin û dest pê qirkirinekê bikin. Berpirsyarê çapemeniya QSD'ê jî raya giştî li hember vê xeterîyê şîyar kiri bû.

UNICEF`ê yê jî 25`ê Çileyê têkildarê ewlehiya zarokên 'Eşbal El-Xîlafê' yên girtigehê de daxuyaniyeke da. QSD'ê bersiva vê daxuyaniyê da û got, em hemfikirin ku mafê van zarokan bê parastin û walatên van zarokan xwedî li zarokên xwe derkevin û di perverdeyekê ewlehî de derbaz bikin ku bikaribin dîsa vegerin nava civakê.

FacebookTwitterWhatsAppTelNavenda Ragihandinê ya Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) daxuyaniyek da û tê de bersiva daxuyaniya UNICEF`ê ya têkildarî rewşa zarokên "El El-Xelîfê" da.

Navenda Ragihandinê ya Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD di daxuyaniyê de wiha got:

QSD`ê daxuyaniya UNICEF`ê ya di dîroka 25`ê Çileya 2022`yan de têkildarî rewşa zarokên di operasyonên li dijî DAIŞ`ê de hatine girtin û bi navê "Eşbal El-Xîlafê" tê naskirin, wergirt.

Fermandariya Giştî ya QSD`ê daxuyaniyê pêwazî dike û di heman demê de destnîşan dike ku divê rêzerastiyên li jêr neyên paşguhkirin:

QSD`ê wek vebijareke demkî





neçar ma wan zarokan bigire, da ku wan biparêze û di heman demê de civakê ji wan biparêze. Ev tedbîrên demkî ne heta ku çareseriyên guncew bibîne.

Zarokên "Eşbal El-Xîlafê" ji çeteyan hatine cudakirin û hucreyên wan ên taybet hene. Ev yek li gorî perspektîfên NY`yê pêk hat. Hêzên me lîste tevî hûrguliyên têkildarî wan zarokan şandin. Li ser wê yekê, hêzên me derfet da gelek rêxistinên mirovî ku destekê bide wan zarokan û bernameyan ji wan re deyne, da ku wan ji nû ve perwerde bike.

Hêzên me di radeya yekemîn de mîna ku bûne qurban bi wan zarokan re mijûl bû. Em pabendî lihevkirinên parastina zarokan in. Ruxmî ku ew zarok di perwerdeyên leşkerî û îdeolojiya tundraw re derbas bûne, hêzên me di Gulana 2021`an de, gelek tedbîrên taybet li gorî pîvanên navneteweyî yên ji bo parastina zarokan li dijî wan zarokan girtin. Gelek caran me bang li NY û civata navneteweyî kir ku berpirsyariyên xwe têkildarî vê mijarê bînin cih û çareseriyên rastîn jê re peyda bikin. Van zarokan vegerînin welatên wan da ku ji nû ve perwerde bikin û tev li civakê bibin, ji bo ku jiyaneke asayî ya zarokan bijîn. Her wiha hêzên me bang li civata navneteweyî û rêxistinên mirovî kir ku desteka pêwîst ji Rêveberiya Xweser re pêşkêş bikin, da ku navendan ji bo ji nû ve perwerdekirina zarokên sûrî û yên biyanî ava bikin û wan vegerînin welatên wan. Lê heta niha ev bangewazî bê bersiv mane.

Di vê çarçoveyê de Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê gelek zarokên DAIŞ`ê radestî welatên wan kirin.

NY û piraniya dewletên endam di sêrî de welatên ku hemwelatiyên wan di nav DAIŞ`ê de hene, ev dosya paşguh kir û sozên ku dane pêk neanîn. Rêveberiya Xweser bi tenê hiştin ku barê meşandina têkoşîna li dijî DAIŞ`ê rake.

Li ser van rêzerastiyên li jor, QSD`ê bang li NY`yê dike ku bi awayekî cidî û çalak welatên ku hemwelatiyên wan di nav DAIŞ`ê de hene, bibin. Bi lez jinan û zarokên DAIŞ`ê bibin. Her wiha bang li UNICEF`ê û rêxistinên mirovî dike ku destekê ji Rêveberiya Xweser re pêşkêş bikin, da ku navendên ji nû ve perwerdeyê li gorî pîvanên mirovî dûrî girtîgehan ava bikin."

# Kongra Star ya Ewropayê serkeftina QSD`ê pîroz kir

**Navenda Nûçeyan-Qamişlo**

**Duh QSD`ê ragihandibû ku plana DAIŞ`ê û hevkarên wê ya li dijî girtîgeha Sînaa têk çûye û piştî şerên 7 rojan, girtîgeh bi giştî hat kontrolkirin. Herwiha da zanin ku operasyona paqişkirinê ya li dijî DAIŞ'ê li bajar berdewam e.**

Kongra Star di daxuyaniya xwe de got, Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê rojeke dîrokî bû ku bi tîpên zêrîn hat nivîsandin. Serkeftineke din li Hesekê li serkeftinên QSD, YPJ û Hêzên Ewlekariya Hundirîn ên li hember dijminên mirovahiyê DAIŞ'ê ku dewleta Tirk desteka wê dike, zêde bû. Wan bi vê êrişên DAIŞ'ê xwest di salvegera dagirkirina Efrînê de xewnên xwe yên mêtingeriyê di dagirkirina herêmên ewle de pêk bînin, lê di salvegera rizgarkirina Kobanê de ev xwewna wa dîsa têk çû.

Kongra Star da xuyakirin ku êrişa li ser girtîgeha Sînaa ji hewldanên dewleta Tirk ji bo vejandina DAIŞ`ê bû, lê bi saya berxwedana QSD, YPJ û Hêzên Ewlekariya





Hundirîn ew êriş û armanca dewleta dagirker têk çû.

Koordînasyona Kongra Star teqez kir ku bi yekitiya gelan hemû komplo wê têk biçin û serkfetina QSD û Hêzên Ewlekariya Hundirîn li gel salvegera 7`an a rizgarkirina Kobanê pîroz kir û şehîdên berxwedanê bi rêzdarî silav kir.

Di dawiya daxuyaniyê de wiha hate gotin: "Bê guman berpirsyariya tunekirina DAIŞ`ê ne tenê dikeve ser milê gelê herêmê, divê civaka navneteweyî û hêzên navneteweyî berpirsyariyên xwe bînin cih û eniya têkoşînê li dijî dijminê mirovahiyê bikin yek."

# Qubat Talebanî: Em teqdîr û rêzdariyeke mezin ji QSD'ê re nîşan didin

**Navenda Nûçeyan-Qamişlo**

**Qubat Talebanî diyar kir ku çeteyên DAIŞ'ê dixwestin careke din xwe bi rêxistin bikin; aramiya herêmê têk bibin û got, em teqdîr û rêzdariyeke mezin ji şervanên QSD'ê re nîşan didin û hevxemiya xwe ji şehîdan re nîşan didin.**

DAIŞ'ê di 20'ê Çileyê de li Taxa Xiwêran a Hesekê êrişî Girtîgeha Sînaa kir. Di 26'ê Çileyê de QSD'ê ragihand ku hêzên wan girtîgeha Sînaa bi tevahî xistiye bin kontrola xwe.

Cîgirê Serokwezîrê Herêma Kurdistanê Qubat Talebanî têkildarî serkeftina şervanên QSD'ê li hesabên xwe yên twitter û Facebookê peyamek weşand.

Peyama Qubat Talebanî wiha ye:

"Teqdîr û rêzeke mezin a me ji ew mêrxasî û fedekariya Hêzên Sûriyeya Demokratîk ku li bajarê Hesekê ya Rojavayê Kurdistanê nîşan dan heye ku karîn terorîstên DAIŞ'ê yên ji girtîgeha Sînaa ya li taxa Xiwêran revîne destgîr bikin. Terorîstên DAIŞ'ê dixwestin bi rêya dirustkirina bûyerek aloz, aramiya deverê têk bidin û careke din xwe xurt bike.

Em hevxemiya xwe ji bi kesûkarên şehîdên operasyonê nîşan didin û hêviya başbûnê ji birîndaran re dixwazîn.

Ev bûyer ji me re dibêje ku DAIŞ hîna metirsiyeke zindî ye û divê li Herêma Kurdistanê û Iraqê jî jê xafil nebin û di amadekariyê de bin. Erka me hemûyan e ku em em rê li ber vê metirsiyê bigrin."



# Têkçûna planên li ser Hesekê bi qasî Serkeftina Kobanê girîng e

Li gorî çavdêran; êrişa DAIŞ'ê ya ser girtîgeha Sînaa di encama plansaziyeke kûr û dirêj de pêk hatiye û gelek aliyên herêmî û navdewletî tê de cih girtine. Çeteyên DAIŞ'ê jî tenê amûrek pêkanîna komploya hêzên paşperdeya wê ne.

**Idrîs Henan-Şehba**

**'Şerê faşîzmê yê li dijî demokrasiyê ye'**

Siyasetmedarê Kurd Ertûş Bozkurt li ser mijarê ji rojnameya me re axivî û diyar kir ku li paş êrişa DAIŞ'ê desteka navneteweyî û herêmî heye. Bozkurt teqez dike ku hemû aliyên hegemon ên li qada Rojhilata Navî, di nava pêşbirka mezinkirina qezencê de ne, li ser tunekirina şoreşa Rojava, Bakur û Rojhilatê Sûriyê li hev kirine û axiftina xwe wiha dewam kir: "Rastiya li Bakur û Rojhilatê Sûriyê derketiye hêviya gelên Rojhilata Navîn e. Hêzên dîktator û destpotîk ti carî aramî, demokrasî û wekheviyê hezim nakin. Şerê faşîzmê li hemberî demokrasiyê ye. Êrişa ser gerîlayan, ambargo û girtina deriyê Sêmalka, hemû parçeyên êrişa li ser Hesekê ne û planên Tirkiyê ne".



**'PDK û ENKS piyonên plansaziyê ne'**

Bozkurt li ser rola hêzên navneteweyî di van êrişan de axivî û ev xal anî ziman: "Rola Ingiltire di diyarkirina siyasetên Rojhilata Navîn de diyarker e. Da ku piştgiriya Tirkiyê li Ukranya, Bîlarûsya û deverên dîtir werbigire, daxwaza Tirkiyê ya tunekirina statuya Bakur û Rojhilatê Sûriyê qebûl kiriye. Erka wê; aqilê vê yekê bide, piştgiriyê ji aliyê dîplomatîk, aborî û siyasî bike".

Bozkurt di dirêjahiya nirxandinên xwe de li ser berjewendiya PDK'ê û ENKS'ê di vê êrişê de wiha dibêje: "Berjewendiya her aliyekî di van êrişan de diyar e. Helwesta hikûmeta Şemê jî tê fêmkirin, lê PDK'ê û ENKS'ê çima cih di plansaziya êrişê de digirin? Ji bo parastina desthilatdariya malbatî û kesayetî tenê piyonên vê plansaziyê ne. Wê ev tevgera wan, gelek tiştan ji Kurdan bide wendakirin".

**'Divê Rêveberiya Xweser bê naskirin'**

Siyasetmedarê Kurd Ertûş Bozkurt di dewama axaftina xwe de serkeftina gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê pîroz kir û bang li Kurdên çar parçeyên Kurdistanê û derve û hêzên demokrasîxwaz kir ku xwedî li şoreşa gelan a Bakur û Rojhilatê Sûriyê derkevin û siyasetên PDK'ê û ENKS'ê yên li ser bingeha firotina axê bibînin. Û wiha bi dawî li axiftina xwe anî: "Divê her Kurdek bi zelalî bibîne ku PDK'ê û ENKS'ê li dijî berjewendiya gelê Kurd in. Divê hêzên navdewletî jî Rêveberiya Xweser nas bikin û piştgiriya xwe jê re zelal bikin."

**'ENKS'ê xeta hevkarê dagirkeran e'**

Rojnamevan Mihemed Şahîn jî li ser heman mijarê axîvî û bi bîr xist ku hêzên hegemon di dîzayina herêmê de hesabê pêşketina Tevgera Azadiya Kurd û statuya wê nekiribûn û wiha got: "Berî ku mudexele bikin tedbîr girtin û êrişî Tevgera Azadiyê kirin û bi kompoloyekê navnetewî Rêberê gelê Kurd dîl girtin. Lê tişta hesab dikirin pêk nehat. Tevgera Azadiyê veguherî hêza sereke ya herêmê û civaka Kurd zêdetir bi rêxistin bû".



Şahîn jî teqez dike ku rola siyaseta dewletên derve li ser herêmê heye wiha didomîne: "Çawa xeta hevkar di xizmeta dagirkeran de bû, hevdîtina ENKS'ê bi şêwirmendê Ingiltere li Stenbûlê di heman çarçoveyê de ye".

**'Lehengiya li Hesekê dewama berxwedana Kobanê ye'**

Rasthatina êrişên ser Hesekê bi çaremîn salvegera êrişên 20 Çile yên li ser Efrînê Şahîn tesaduf nabîne û diyar dike ku plana wan; valaderxistina vîna gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bû û planê wiha dixwîne: "Piştî revandina çeteyên DAIŞ'ê wê statuya Kurdan û herêmê li tevahî cihanê bixistana nîqaşê. Dê bigotana ku QSD'ê nikare ewlehiya herêmê biparêze û hewce bi hêzeke din heye. Wê herêm li gorî hinek lihevkirinên nepenî yên Tirk-Ingilîzan radestî Tirkiyê kiribana û dê PDK'ê beşek wê ba ye. Xeyalên wan ew bûn ku roja 26 Çile ya serkeftina Kobanê bikin roja binkeftina şoreşa Rojava. Dixwestin Kurdan sedsalek din bê statu bihêlin û baweriya civakên din bi Kurdan nehêlin ku hêza xwe ya pêşengiyê ji dest bidin. Eger îro statuya Bakur û Rojhilatê Sûriyê hedef be, wê sibe jî statûya Başûrê Kurdistanê be. Lewra têkçûna plansaziya li ser Hesekê bi qasî serkeftina Kobanê girînge. Hêzên ku li Kobanê têk çûn, xwestin li Hesekê tolê hil din. Lehenegiya li Hesekê hatiye raberkirin, dewama berxwedana Kobanê ye".

**'Naxwazin statûya Rojava nas bikin'**

Şahîn di nav nirxandinên xwe de behsa bêdengiya navneteweyî jî kir û îşaret bi herdu projeyên li herêmê kir û got, Li herêmê du xetên dijber hene. Yek pergala Amerîka ku bi sedan sal in herêm kiriye gola xwînê, ya din jî pergala paradîgmaya Tevgera Azadiyê ya Konfederasyona Rojhilata Navîn e. Ji lewra naxwazin li dijî hişmendiya wan pergala Rêber APO xort bibe. Çiqas xwe wek hevalbendên Kurdan bidin xuyakirin jî, dixwazin Kurd li ser xeta PDK'ê û ENKS'ê ya teslîmkar, dijminê hemû civakan, nijadperest û her di nav aloziyê de bin. Ji ber vê çavên xwe li ser êrişên bi vî rengî digirin û li qada navneteweyî zêde rê li ber naskirina statuya Rojava, Bakur û Rojhilatê Sûriyê venakin".

# Destê dagîrkeriya tirkî û rêjîma Sûriyê di êrişên çeteyên DAIŞê de heye

**Mihemed Xanim/Qamişlo**

**Mihsin Ewedelah: Bi lehengiya Hêzên Sûriyaya Demokratîk û piştgiriya gelên herêmê, planên dijminên mirovayiyê têk çûn.**

Têkildarî êrişên çeteyên DAIŞê yên ser girtîgeha Sînaa ya bajarê Hesekê û planên ku hatibûn çêkirin, nivîskar û rojnemenanê Misrî Mihsin Ewedelah ji me re axivî.

Ewedela bal kişand ser hûrgiliyên êrişên çeteyan yên ser girtîgehê û piştgiriya welatiyên navçeyê ji QSDê re û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Wekî tê zanîn ji piraniya van çeteyên êriş kirîn, ji Serê Kaniyê, Girê Spî û hinek jî ji milê Iraqê ve hatine. Van çeteyan xwe di Taxa Xiwêran de bi cih kirine û bi erebeyên bombe barkirî êrîşî girtîgehê kirin. Hinek çeteyan karîbûn ku xwe bigihînin bînayeta Fakûlteya Îqtîsatê ya li kêlaka girtîgehê. Lê hêzên QSDê piştî berxwedaniyeke mezin, girtîgeh û derdora wê xistin bin kontrolê de. Her wiha nişteciyên taxa Xwêran û tevayî taxên bajarê Hesekê, alîkariyekî mezin dan hêzên QSDê û ev yek cihê kêfxweşiyê ye. Ji her kesî re diyare ku tevaya gelên herêmê li pişta Hêzên Sûriyaya Demokratîk in û wê planên dijminên projeya biratiya gelan têk biçin."

**'Divê cîhan hesab ji dewleta tirkî bixwaze'**

Ewedelah diyar kir ku destên hin hêzên herêmê di van êrişan de hene û axaftina xwe wiha domand: "Êrişa li dijî Girtîgeha Sînaayê bi plankirî hat kirin û xwedî armancên mezin bû. Yekser tiliya dewleta tirkî tê de heye. Li gorî agahiyên belgekirî, dewleta tirkî dixwaze aramiya herêmê têk bibe û DAIŞê zindî bike da ku planên xwe yên dagîrkirinê pêk bîne. Di dema êrişên çeteyan yên ser girtêgeha Xwêran de, dagîrkeriya tirkî êrişî herêmên Til Temer û Êyn Îsa kir, her wiha hêzên ku dixwestin ji wan herêman biçin ji bo piştgiriya QSDê, hedef hatin girtin. Ji ber hevkariya bi vê planê re divê cîhan hesabê ji dewleta Tirkî bipirse. Wê DAIŞ berê xwe bide her kesî û bibe sedema pêkhatina komkujiyan. Ji bo tunekirina DAIŞê hewcehî bi hevkariyeke domdar ya di qada navneteweyî heye. "

**'Binavkirina DAIŞ wek xelkê sivîl aligiriya êrişên çeteyan e'**

Ewedelah da zanîn ku rêjîma Sûriyê di gelek aliyan de piştgirî dayê êrişên çeteyan yê ser girtîgehê û wiha axivî: " li gorî zanyariyan, beriya ku ev êriş pêk were, rêjîma Suriyê hêzên xwe ji aliyê herêma Tedmir û derdora wê vekişandin. Da çete bi hêsanî derbasî herêmên Rêveberiya Xweser bibin. Her wiha ragihandina rêjîmê, çeteyên DAIŞê wekî xelkê sivêl binav dikirin û ev yek jî destekdayîna wan ji çeteyên DAŞê re eşkere dike."

**'QSD ji bo seranserê cîhanê şer dike'**

Nivîskar û rojnemevanê Misrî Mihsin Ewedelah ji dewletrên cîhanê xwest ku piştgiriya Hêzên Sûryaya Demokraîk bikin û wiha axaftina xwe qedand: "Em di serî de berpirsiyariya welatên ji endamên NATO'yê bibîr dixin ku bila plana li pişt vê êrişê ronî bikin û hêzên ku destek dane çeteyan ceza bikin. Ji tevaya cîhanê tê xwestin ku welatiyên xwe yên di nava DAIŞê de ne, malbatên wan û zarokên wan werbigirin û dadgeh bikin. Ji bo çareserkirina kirîza girtiyên DAIŞê yên li herêmên Rêveberiya Xweser, pêwîste dewletên cîhanê çeteyên xwe bibin û wan li welatên xwe dadgeh bikin. Yan jî Rêveberiya Xweser qebûl bikin û destekê bidin wê, ji ber ku QSDê di ber tevaya cîhanê de şer dike.

Eger ku cîhan destekê nede QSDê wê DAIŞ ji nûve xwe rêxistin bike. Pêwîste dewletên cîhanê Rêveberiya Xweser qebûl bikin û destekê bidin wê, hêzên QSDê di ber tevaya cîhanê de şer kiriye û hîn jî şwer dike."





## Pêşdîtinên Ocalan…

**Faruk Sakik**

Di destpêka salên 1980'yî de li Tirkiyê gelek rêxistinan ji ber darbeya leşkerî berê xwe dan Rojhilata Navî. Di wê demê de şerê Filistîn û Israîlê jî hebû. Van rêxistinan dixwest di nava vî şerî de xwe biparêzin, an jî ji nû ve bi rêxistin bibin. Ji van rêxistinan gelekê wan li vê derê û hin wan jî derbasî Ewropa bûn û li wê derê heliyan.

Lê Ocalan bi tedbîr, bi startejiyeke cuda, bi têkiliyên diplomatîk, di mayîna Rojhilata Navî de, israr kir.

Piştî şerê Lubnanê bi dawî bû, ew jî derbasî Sûriyê bû. Bi serokê Sûriyê Hafiz Esad re danûsandinên wî dest pê kirin. Esad hat îknakirin. Kampek ji bo perwerdeya eskerî û siyasî ava kir. Di heman demê de li devera ku Ocalan dima Dibistana Partiyê jî hat avakirin. Ev der weke eniyekeşer bû. Gerîla li dibistana Partiyê perwerdeya siyasî û li akademiyê jî perwerdeya siyasî didîtin. Gerîla li van navendan piştî perwerde dibûn, derbasî Bakurê Kurdistanê dibûn. Wê demê gelek kesan ev têkiliyên Ocalan bi Esad re û mayina PKK'ê li Sûriyê weke teslimiyetek pênase kirin. Gelek rexne û polîtîkayên reşkirinê jî wê demê hebûn. Herkesî digot ku Hafiz Esad Ocalan bi kar tîne. Ev yek ji navendek dihat organîzekirin da ku PKK ji Sûriyê derkeve.

Sal derbas bûn hat îspatkirin ku Ocalan Hafiz Esad bi kar aniye. Herkesî Ocalan mafdar dît û hebûna wî ya li Sûriyê di cîh de dîtin. Hêzên komploger jî ev yek dîtin û ji bo ku wî ji Sûriyê derxin ketin nav hewldanan. Ocalan dema dît ku hebûna wî ya li Sûriyê êdî mîsyona xwe temam kiriye û mayîna wî ew ê zirar bide doza Kurdistanê, ji Sûriyê derket.

Îro eger Ocalan azad bûya û ev şerê Rojhilata Navîn jî dewam bikira, wê pêşî li gelek karesetên ku diqewimin bigirta. Eger îro Ocalan azad bûya wê di şerê Sûriyê de ji bo doza Kurdistanê hin mutefîkên nû bidîtana. Me pêşdîtinên Ocalan di berxwedana Kobanê de dît. Kobanê li ber têkçûnê bû, Ocalan li Îmraliyê perspektifên parastina Kobanê da. Li ser vê yekê li Bakurê Kurdistanê serhildanan dest pê kir û hemû gel ber bi Kobanê bi rê ket. Li Pirsûsê eniyeke sivîl hebû û wek eniyek li pişt şer aktîf bû. Cîwan, îxtiyar, zarok, jin derbasî Kobanê dibûn û şer dikirin. Berxwedaneke mezin hebû.

Ev berxwedan û ev hêz ji aliyê hêzên koalîsyonê ve hat dîtin û xwestin di têkoşîna li dijî DAIŞ'ê de li kêleka kurdan cîh bigirin. Rojek me dît ku balafirên xwe rakirin û tevlî berxwedana Kobanê bûn. Heger Ocalan midaxale nekira û kurdan jî berxwedan xurt nekirina, van hêzan wê midaxale bikirina gelo? Çima dema DAIŞ ket Reqqa û Mûsilê midaxale nekirin? Ji bo ku li wan herdu bajaran hêzek ku li ber xwe bide tune bû. Hêzên dewleta Iraq û Sûriyê jî tune bûn. Ji xwe hêzên komploger ev yek dîtin û di kompoyê de israr kirin. Ji AKP'ê xwestin tecrîdê girantir bike dengê Rêber Apo negihîje derve. Di vê pêvajoya tecrîdê de, DAIŞ ji nû de bi rêxistin kirin û berê wê dan Hesekê. Lê şervanên kurdan pêşdîtina Ocalan a ji bo Hesekê jibîrnekiribûn.

Rêber Apo di hevdîtina 3'yê Nîsana 2013'an de ji Şandeya Îmraliyê re wiha dibêje: "Ez ji bo Hesekê dibêjim. Ev gelek girîng e. Ger wê derê bi dest bixin dê komkujiyê bikin. Heke Hesekê ji dest biçe, ev berpirsyariya wan e. Divê ji bo Hesekê jî hêzeke xweparastinê ava bibe. Ne tenê Kurdên li wir, hewce ye Ereb û Suryanên li wir jî bên parastin."

Şervanan jî ev yek kir û pêşî li hewldanên DAIŞ'ê yên dagirkirina Hesekê girtin.



# Waliyê Riha'yê di du mehan de 7 caran bi çeteyan re hevdîtin pêk anî

Waliyê dewleta tirkî yê li Rihayê Abdullah Erîn di nava 2 mehên dawî de bi hincetên cuda herî kêm 7 caran li bajarê Serê Kaniyê û Girê Spî têkilî bi çeteyan re danî.

**Arjîn Roj /Qamişlo**

Hêjayî bir anînê ye ku dema çeteyên DAIŞ'ê êrişî girtîgeha Sînaa ya Hesekê kirin, dewleta tirkan ya dagîrker jî hemwext êrişî, Şingal, Til Temir û Eyn Îsa kir. Di van êrişan de zarok û walatî şehit ketin û gelek jî bîrindar bûn. Herwiha berî van êrişan ku demekê kêm bû, li gorî agahîyên ajansa Hawar girtîn, li Enqerê ji aliyê MÎT'a dewleta tirkî ve civîneke veşartî bi serçeteyên li herêmên dagîrkirî (Efrîn, Serê Kanîyê, Girê Spî) ve hatibû kirin. Li gorî agahiyên hatîn bidestxistin, di vê cîvîna veşartî de serçeteyan ji MÎT'ê çekên giran û dolar xwasti bûn.

Waliyê dagîrker yê li Rihayê Abdullah Erîn jî di nava 2 mehên dawî de bi hincetên cuda herî kêm 7 caran li bajarên Serêkaniyê û Girê Spî re têkilî bi çeteyan re danî. Di heman demê de gelek caran serdana Erîn a ji bo qeyûm tayînî herêma bi navê "Operasyona Kaniya Aştiyê" hatibû kirin. Serleşkerek (7. Kolordu komutani) û hin personelên leşkerî jî bi Waliyê dagîrker Erîn re dikevin van têkilîyan. Abdullah Erîn yê ku herî dawî di 14'ê Çile de çobû Girê Spî, di 2'yê Çile de jî li Serêkaniyê bû.

Hin têkiliyên waliyê dagîrker ku tê gotin, "alîkarî, kontrol û xizmet" ev in:

* Di 27'ê Kanûna 2021'an de Erîn û fermandarê leşkerî û personelên leşkerî yên bajêr çûn Serê Kaniyê.
* Di 23'ê Kanûna 2021'an de Erîn û peywirdarên leşkerî di bin navê "hevdîtina bi gel re" çûn Girê Spî.
* Di 17'ê Kanûna 2021'an de Walî Erîn di bin navê "hevdîtina bi gel re" çû Serêkaniyê.
* Di 16'ê Kanûna 2021'an de Erîn û kesên pê re derbasî Serêkaniyê bûn.
* Di 2'ê Kanûna 2021'an de Erîn di bin navê "Serdana esnafan" de çû Girê Spî.

3 cîvînên bi Soylu re

Walî Erîn di demê van serdanên xwe yên pêyhevdu ku li bajarên dagîrkirî dikir de 3 civînên cuda hatin lidarxistin:

Bi beşdariya Wezîrê Karên Hundir yê Tirk Suleyman Soylu, waliyên dagîrker yên Riha, Hatay, Dîlok û Kilîsê di bin navê "Civîna Hêza Peywira Sûriyeyê" de civîn li dar xistin. Civîna herî dawî ya vîdeokonferansê di 12 Çile de bi beşdariya heman walîyên bajara hate lidarxistin. Di 19ê Kanûna 2021ê de bi pêşengiya Soylu, waliyên 4 parêzgehan li Kilîsê civiyan. Heman walî di 14'ê Kanûna 2021'an de bi vîdeokonferansê civînek li dar xistin.



Hêjayî bîrxistinê ye ku Wezîrê Parastinê yê Tirkiyeyê Hulusî Akar jî, derbarê îdiayên êrîşên 11ê Çileyê yên li dijî leşkerên tirk ên li herêmê da daxuyanî da û got, "Ev êrîşên plankirî yên li derveyî sînorên me gihîştiye sînorê tehemula me. Operasyonên me yên cezakirinê wê bi lez û bez û tundî berdewam bikin."

Piştî li gîrtîgeha Sînaa hatîn şkandin û operasyona paqijîyê hatî kirin ji aliyê daxuyaniya QSD'ê ve hat diyarkirin ku ji 200 endamên DAIŞ'ê yên êrişê gîrtîgehê kirin, piraniya wan li herêmên bin dagîrkeriya dewleta tirkî de hatîn e.

Eger em têkîliyên dewleta tirk yên beriya vê bûyerê ku bi DAIŞ'ê re ku bi belgeyan hîtî tespîtkirin bi giştî ji bîr bikin jî; Tinê li gor van agahiyên li berçav, ekît dibe ku dewleta tirk çeteyên DAIŞ'ê li herêmên dagirkîrî de bi rêxistin kirîne. Li gor agahî û nêrînên heyî, Êdî çeteyên DAIŞ bûyîne leşkerên dewleta Tirkiyê û wê bi van çetayan ji bo tevlîhevî û qirkirina gelên Rojhilata Navîn bi kar bîne. Dewleta Tirkiyê ji bo Rojhilata Navîn bûye xeteriyekê pir mezin û li hember vê xeteriyê bêdengî jî xeterîyekê mezintir e.



# Zeyneb Mûrad: Hevdemiya êrişan organîzekirî bû

**Ronahî-Dirbêsiyê**

**Rêveberiya Kongreya Star ya Kantona Hesekê Zeyneb Mûrad got, êrişên vê mehê yên ser bakur û rojhilatê Sûriyê, plankirî bûn, ne ji nişka ve bûn.**

Ji destpêka vê salê ve li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê bûyerên bilez diqewimin, bi taybetî yên girêdayî aliyê leşkerî. Yek jê balafirên hewayî yên dewleta tirkî ya dagîrker li asîmanê Sûriyê bûn. Bombebarana li ser sivîlan, mîna êrişên ser Kobanê, Til Temir û Zerganê ku diqewimîn. Li aliyê din şaneyên razayî yên çeteyên DAIŞ'ê êrişî girtîgeha El-Sînaa ya li taxa Xiwêran ya bajarê Hesekê kirin ku 5 hezar çeteyên DAIŞ'ê yên ku ji aliyê Hêzên Sûriyeya Demokratîk (QSD) ve di operasyonên xwe yên li dijî çeteyan de debûn destpêkirin hatin girtin.

Tişta ku balê dikişîne, dema di navbera van bûyeran de ye. Dema ku Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) li hemberî şaneyên şer dikirin, balafirên dewleta tirkî ya dagîrker, gundên Eyn Îsa û derdora wê bombebaran dikirin. Di encamê de bi dehan sivîl şehîd û birîndar bûn.



**`Dewleta tirkî ya dagîrker rola sereke di van komployan de dilîze`**

Derbarê mijarê de rojnameya me bi Rêvebera Kongreya Star ya Kantona Hesekê Zeyneb Mûrad re hevdîtinek pêk anî. Zeyneb got, li dijî herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê siyaseteke qirêj tê meşandin. Zeyneb wiha axaftina xwe domand: "Destê gelek aliyên herêmî û navneteweyî di vê siyasetê de heye. Lê dewleta tirkî ya dagîrker di van polîtîkayan de rola sereke dilîze. Îstixbarata hikûmeta Şamê jî di van komplo û siyasetan de cih digire û ev yek di bûyerên vê dawiyê ya zindana Sînaa ya Hesekê nîşan da. Armanca sereke ji van êrişan têkbirina projeya Rêveberiya Xweseriya Demokratîk li bakur û rojhilatê Sûriyê ye. Lewra ev proje dijî zîhniyeta şovenîst ye ku bi sedsalan li herêmê serdest e."

Zeyneb Murad di berdewamiya axaftina xwe de wiha got: "Dijminên me bi sedsala ye dixwaze îradeya me bişkînin. Ji ber vê yekê em dibînin ku ji hemû aliyan ve êrişî me dikin. Dewleta tirkî ji bo şikandina projeya me hêzê dide çeteyên DAIŞ'ê. Lê qehremaniya ku hêzên QSD'ê nîşan didin, her tim van planan pûç dike û nahêle ku bigihên armanca xwe."

**`Divê çeteyên DAIŞ`ê bi dewleta tirkiyê re werin dadgehkirin`**

Zeyneb wiha dirêjî da axaftina xwe: "Ji dawiya şerê Baxozê ve li gundewarê Dêra Zorê, Hêzên Sûriya Demokratîk û Rêveberiya Xweser li ser dosya dadgehkirina DAIŞ`ê bangewaziya xwe di ragihandine. Rêveberiya Xweser daxwaz ji hêzên navdewletî kir ku rêxistina pêkhateyan dadgeh bike, lê hêza navdewletî heta niha ti bersiv nedaye. Ev jî nîşan dide ku ev welat ji bo bidawîkirina dosyaya DAIŞ`ê ne cidî ne û dewleta tirk jî bi DAIŞ'ê re kar dike û xwediya heman sûcan e."

Rêvebera Kongreya Star ya Kantona Hesekê Zeyneb Mûrad axaftina xwe wiha bi dawî kir: Dosya girtiyên DAIŞ'ê dosyake mezin e, ku nayê biçûkirin û Rêveberiya Xweser bi tena serê xwe nikare bi vê dosyayê re mijûl bibe. Ev çete ne yên walatê me ne, hemû yên walatên derve ne. Ji ber wê divê welatên mezin erk û berpirsiyariyên xwe pêk bînin. Rola wan jî di çareserkirina vê dosyayê de heye. Eger ev çete neyên dedgehkirin, wê metirsî li ser cîhanê bi giştî hebe."

**Fener…..**



## Ala Rêber Apo her li jor diheje

**Idrîs Henan**

Desthilat û rejîmên serdest ên li Kurdistanê dayîm hebûna xwe li ser bingeha tunebûna Kurdan û gelên resen domandine. Ji bo wan rêgez û prensîbek jêneveger e. Jixwe ji çendsed salên derbasbûyî wer lê hatiye û bi dekûdolabên çewsîner ên li dijî gelan û bi hevalbendên hundirîn textê Kurdan hilweşandine û mişextî dunyayê kirine. Çiqas raperîn û serhildanên Kurdan çêbûne, hemû jî di heyamek bêdengiya dişibe ya îro de hatin pelçiqandin û qirkirin. Hewldanên îro ne dûrî yên yên duh in. Tenê rê û rêbazên têkoşînê û li rengê qirkirinê teknîka çekwar bar kirine. Ferq û cudahiya îro û duh ew bû; dibe ku bapîrên me bi serhişkî, lehengî, mêranî û qehremaniya xwe, xwe gihandibin roja îro. Lê di roja îro de jî li ber keviyê derba dawî a tuneker bûn. Gelê Kurd bi xisûsa xwe ya hezê ku jiyanwar û jiyandar e, dikarîbû ji nav xaliya estiyên pêşiyan ji nû ve xwe bivejîne û vîna xwe ya hebûnê deyne holê. Dibe ku serdestan di dema parvekirin û xêzkirina nexşan de ti hesabê Kurdan nekiribin, lê bayê li paçê keştiyan dixe li gorî dilê wan neziviri û gelê Kurd ne tenê ji bo xwe, ji bo hemû cîhanê bû meqseda hêviyê. Ji nû ve li ser kokên xwe hişîn hat û li her dera cîhanê bêhna kulîlkên wî vedan.

Bi damezirandina Tevgera Azadiyê ya ku li ser paradîgmaya Rêber APO şax vedaye û bi rêbaz û şêwazên pêkve jiyanê, azadî, wekhevî û demokrasiyê, navendên biryara hegemonîk tengav bûn û hemû projeyên wan ên ji bo Rojhilata Navîn asteng bûn. Ji lewra hewldanên destwerdanê bi pêş xistin û di serî de berê xwe dan kaniya jiyanê ya vê paradîgmayê. Berî her tiştî Rêber APO dîl girtin û asta êriş û şerê li ser Tevgera Azadiya Gelan bilindtir kirin. Wisan texmîn dikirin ku wê gel ji rêxistin û rêberê wê qut bikin ku, weke hercarê, bi yek derbeyê bipelixînin. Lê herhal hesabê vê yekê nekiribûn ku sûka civakan naşibe bazarên koletiyê yên afirnadine. Li sûka gelan daxwaz û tîna azadiyê pir bû. Ji bona wê jî rêbaz û alavên ku armancê misoger dikin pêwîst bû bihatana afirandin. Ancax ew yek jî bi ideolojiyek nû pêkan bûya ku veguheriya tevger û bizaveke dîrokî a gelan a têkneçûyî. Ji ber vê jî çiqas asta êrişan li ser Tevgera Azadiyê zêde bûne ewqas tevger bi hêz bûye û rêxistibûna civakê zêdetir bûye. Çi êrişa bi çi teknîka herî pêşketî rû da be, li beramberî vîna gelê birêxistinkirî têk çûye û bê wate maye.

Îro tişta di tevahî serpêhatiya Şoreşa gelan a Rojavayê Kurdistanê de têye jiyîn heman tişta me li jor gotiye. Ango serdehevbûna nirxên paradîgmaya jiyana azad a felsefeya Şaristaniya Demokratîk a Rêber APO afirandiye. Li Rojava, Bakur û Rojhilatê Sûriyê senteza Rêber APO li hemberî tarîtiyê bi ser dikeve. Hewldanên têkbirinê çi dibin û ji ku dibin bila bibin, çi şimitîneke zihnî yan fîzîkî dibe bila bibe, çi jirêderketinek dibe bila bibe û çi hevkariyek bi dagirkeran re dibe bila bibe nikarin li hemberî senteza Rêber APO a jiyanê kêliyekê jî li ber xwe bidin. Dibe ku asta texrîbat, bobelat û rûxîneriyê pir bibe, lê ala Rêber APO her li ser stûna dara azadiyê ya bi xwîna hezaran pakrewanên ku nehiştine êriş bi ser kevin hatiye avdan, di singê wan de çikandiye û diheje. Ya li Hesekê jî li jor maye û hejiyaye, ala Rêber APO ye.